

Di kurmanciyê de sîstema deman¹

Îbrahîm seydo aydoğan

1. Destpêk

Armanca vê lêkolînê naskirin û şayesandina demên zimanê kurdî ye. Weke ku tê zanîn, gelê kurd, ku hejmara wî li derdora sîh milyonan e, di nava gellek welatan de hatiye parvekirin û zimanê kurdî xwedan çar zaravayên mezin e ku em ji wan re dibêjin *kurmancî, soranî, zazakî û goranî*². Awayê avakirina demên van zaravayan ne weke hev in û dîroka bikaranîna wan ya li welatên ku Kurd lê dimînin jî herweha ji hev cuda ye. Wek mînak, digel ku kurmancî û zazakî li Turkiyeyê hatibûn qedexekirin, soranî, ji destpêka salên sîhî ve ye ku, bi awayekî fermî, weke yek ji zimanên Iraqê tê naskirin³. Ji ber ku pirraniya Kurdên Turkiyeyê bi kurmancî dipeyivin, divê mirov serdestkirina soraniyê ya li ser kurmanciyê, weke ku sosyologê navdar Ismaîl Beşikçi jî di hevpeyvîneke xwe de dibêje⁴, di nava çarçoweya danûstendinên Komara Tirkîyeyê û Iraqê de binirxîne. Beşikçi diyar dike ku ev rewş yek ji xalên bazara van herdu dewletan bû. Li gora vê xalê, heke diviya ku Ingilîzan mafê Kurdan yê zimên bidana wan, diviya ku ev maf bi zaravayê soranî ve bihataya bisînorkirin. Herweha, Beşikçi dibêje ku Komara Tirkîyeyê ji bo bicîhanîna vê xalê hingê dev ji doza xwe ya li herêmen Kerkuk û Mûsilê berdabû.

Kurmancî ew zarave ye ku ji aliyê pirraniya Kurdan ve tê bikaranîn, lê belê, ji ber qedexekirinan, ev zarava li Turkiyeyê tucarî bi awayekî fermî weke zimaneke perwerdehiyê nehatiye bikaranîn. Ji ber xemên homojeniyê xebata xwe, em ê li vira bi tenê behsa zaravayê kurmancî bikin.

¹ Ev xebat bi awayê devkî, di Kongreya Kurdolojiyê de, ku di 5-9'ê îlona 2006'an de li Hewlêrê pêk hat, hatiye pêşkêşkirin.

² Li ser tasnîfkirina zaravayên kurdîyê gellek nêzîktêdayinên cuda hene ku em ê di vê lêkolînê de nekevin nîqaşa wan. Em tasnîfa *Gramera Kurdî* ya Celadet Bedîrxan û Roger Lescot (1970) bi tenê bi kar tînin.

³ Di xala 4. ya Qanûna Bingehîn ya Iraqê ya nuh de, zimanê kurdî, beyî ku zaravayek bête destnîşankirin, weke zimaneke fermî yê Iraqê hate qebûlkirin.

⁴ *Milliyet*, 14'ê adara 2006'an.

1.1. Mijara lêkolînê

Weke ku Aristot di *Poetikaya* xwe de dibêje, dem yek ji van taybetmendiyên e ku nemaze bi lêkeran ve têkildar e.⁵ Hingê, digel ku dem bi hin alavên din din jî dikarin diyar bibin, formên lêkeran weke nîşanên demê ên zelal tî pejirandin.

Ji bo ku mirov demên zimanekî yê lêkeran nas bike, çavkaniya yekem rêzimanên wî zimanî ne. Lê belê, rêzimanên kurmanciyê, di warê destnîşankirin û şayesandina demên lêkeran de ji hev cuda xuya dibin. Gava ku em bala xwe didin rêzimanan û xebatên ku di wî warî de hatine kirin, em dibînin ku hejmara demên kurmanciyê ji yazdehan (11) heta bi bîst û nehan (29) ve tê guhertin. Bê şik, nebûna xebatên zanîstî yê li ser mijara deman girîngtirîn sedema vê cudabendiyê ye.

Rêzimana zimanekî ji ber xwe ve nayê avakirin. Ji bo amadekirina rêzimanan, xebatên ku li ser zimanên din hatine kirin bivê nevê weke model tî pejirandin. Lê belê kurmancî di wî warî de ne bi tenê ye. Weke ku tê zanîn, rêzimana fransî jî ji ber ya latînî ve hatiye girtin.⁶ Lê belê, peywendiya van herdu zimanan ne weke peywendiya kurmanciyê ya bi zimanên din re ye, ji ber ku zimanê ku bi pirranî di amadekirina rêzimanên kurmanciyê de hatiye bikaranîn zimanê tirkî ye û bi dû wî jî zimanên mîna fransî û inglîzî tî. Weke ku tê zanîn demsaziya van zimanan ji demsaziya zimanê kurdî (kurmancî) gellekî cuda ye.

1.2. Metodolojî

Em ê di vê lêkolînê de hewil bidin ku vê pîrsa destnîşankirin û şayesandina demên kurdî bi awayekî zelaltir fahm bikin û bi dû re jî em ê dîsa hewil bidin ku wê di çar qonaxan de çareser bikin. Ji bo vê yekê, em ê berê berê rêzimanên kurdî û xebatên li ser demên lêkeran di warê şayesandina deman de bidin ber hev.

Di qonaxa duyem de, em ê demên ku di van rêzimanan de ji bo kurmanciyê hatine destnîşankirin li gora teoriyên demsaziyê şîrove bikin. Teoriya ku em ê di şîrovekirina van deman de jê destkewtî bibin ew teorî ye ku bi fransî jê re dibêjin « aspectuo-temporelle ». Em ê bi kurmancî jê re bibêjin « pêvajodemkî ». Li gora vê teoriya ku ji hêla Laurent Gosselin (1996)⁷ ve hatiye danîn, gava ku bûyerek bi alîkariya lêkerê ve tê gotin, ev bûyer divê him bi dema (temps, zaman) xwe û him jî bi pêvajoya (aspect-durée, sûre) xwe

⁵ *Poétique*, 1457a.

⁶ Rêzimanên sed sala XVII'an hemû ji ber ya latînî dihatin amadekirin.

⁷ Gosselin (1996), *Sémantique de la temporalité en français*, Louvain-la-Neuve : Duculot, 291 r.

ve bê şîrovekirin. Hingê destpêka bûyerê û bidawîbûyina wê jî teva dema wê alîkariya têgihîştina wê bûyerê dikan. Di vê teoriyê de weha tê qebûlkirin ku sê demên bingehîn ên şîrovekirina bûyeran hene ku teva vegotina wan tên destnîşankirin.

1- Dema axavtinê : dema ku axavker bûyerê rave dike.

2- Dema bûyerê : dema ku bûyer pêk tê

3- Dema referansê : ew dem e ku bûyerê dibîne û wê li ser xêza demê bi cih dike.

Gosselin van deman bi navberan (intervalle) destnîşan dike. Navber ew kêfika demê ye ku teva sînorên xwe yen destpêkê û yê bidawîbûyînê ve tê diyarkirin. Hingê em ê bibêjin *navbera axavtinê, navbera bûyerê û navbera referansê*.

Gosselin bi vî awayî modela xwe pêşkêş dike :

(...) em weha dipejirînin ku alavên pêvajodemkî (daçekên peyvsaziyê, daçekên rêzimanîyê û hevoksazî), li ser xêza demê, navberan teva sînorên pêşîn û paşîn destnîşan dikan. Ev alav, alavên navberan in ku bi hevok û tekstan ve têkildar in û şayesên bûyeran ên pêvajodemkî ava dikan. Çar celeb navber hene : navbera axavtinê ([01, 02]), navbera bûyerê ([B1, B2]) û navbera referansê ([I, II]) ku bi bûyerê ve eşkere dibin, û herweha, dibe ku hoker jî hebin ([ct1, ct2]). Ev model derfetê dide ku mirov şîroveyên nuh ji bo demê û pêvajoyê pêşniyar bike.⁸

Li gora vê modela ku em jê re dibêjin « modela şayesandina bûyeran ya pevajodemkî », ji bo her demeke lêkeran şayesek serbixwe heye û ev şayes naşibe şayesa demeke din. Ji bo têgihîştineke baştir, em dikarin vê modelê bi mînakekê ve bipeyitînin:

(1) Pierre çakêtê xwe li xwe **kir** û **derket**. Baraneke bêrawestan **dibariya**.⁹


1

2

3

⁸ Gosselin (1999), pp. 14-15. (Em bi xwe werdigerînin kurdî).

⁹ Mînaka Gosselin (1999) û (2005).



Em bala xwe bidin bûyera yekem. Sînorên navbera axavtinê bi (01 02) ve hatiye destnîşankirin. (01) destpêka dema axavtinê ye û (02) jî wê kêlîkê nîşan dike ku axavtin lê bi dawî bûye. Yanî, ravekirina wê bûyerê di wê kêlîka navbera du sînorên demkî de pêk hatiye. Ji ber ku navbera referansê (I II) berî navbera dema axavtinê ye, em dizanin ku ev bûyer di dema bihurî de pêk hatiye. Navbera referansê û ya bûyerê (B1 B2) li ser heman sînorî ne, hingê bûyer di dema referansê de pêk hatiye û bi dawî bûye, ji ber ku em dikarin herdu sînorên wê jî, yê destpêkê û yê dawîn, diyar bikin.

Ger em bala xwe bidin bûyera duyem, em ê bibînin ku heman rewş e, lê belê ev bûyer, li gora kronolojiya vegotinê, piştî ya yekem pêk hatiye, ji ber ku ev bûyer nêzîktirî navbera axavtinê ye.

Di bûyera sêyem de rewş tê guhertin. Erê, dîsa ji ber heman sedemê, ji ber ku referans berî dema axavtinê ye, bûyer di dema bihurî de pêk hatiye, lê belê em nizanin bê ev bûyer kengî bi dawî bûye. Bi gotineke din, gava ku *baran* hatiye dîtin, wê baranê ji berê de dest pê kiribû û em nizanin bê di dema axavtinê de baran sekiniye an na. Dibe ku baran hê jî dibare; ji ber wê, herdu sînorên navbera bûyerê bi herdu aliyên ve vekirî ne.

Ev modela Gosselin, ku ji bo zimanê fransî hatiye amadekirin, berê li ser zimanên mina erebî, japonî û wîetnamî jî ji bo şayesandina demên lêkeran hatiye bikaranîn û diyar bûye ku dikare ji bo gellek zimanan bibe modela şayesandinê. Em ê jî demên lêkeran ku ji aliyê rêzimanên kurdî ve hatine destnîşankirin û şayesandin bi rêya vê modelê ve şrove bikin.

Piştî şayesandina demên lêkeran ya bi rêya vê modelê, di qonaxa vê lêkolînê ya sêyem de, em ê di pirtûkên ku bi zaravayê kurmacî hatine nivîsandin de li demên lêkeran bigerin û em ê wan deman bi demên ku di rêzimanan de hatine destnîşankirin re bidin ber hev. Di encamê de jî, em ê li gora van pirtûkên ku em li ser wan xebitîne şayeseke sîstema kurmaciyê ya deman bikin.¹⁰

Berhemên wêjeyî wê derfetê didin mirov ku mirov hemû bikaranînên deman nas bike û mînakên tê de peyda bike. Pirtûkên kurmacî ên ku em ê li ser wan bixebitin roman in. Di wêjeya kurdî heta îroj 108 roman bi zaravayê kurmacî hatine nivîsandin. Ji ber ku bikaranîna kurmaciyê li hemû devaran ne yek e û herweha li her deverê bandora zimanekî cuda li ser e, me bi tenê romanên kurmacî ên ku ji aliyê kurmacî bakurî ve hatine nivîsandin hilbijartin. Di nava hemû romanên kurmacî de, 70 roman ji aliyê Kurdên Tirkîyeyê ve hatine nivîsandin. Me ji nav wan, li gora herêmên nivîskaran, 17 heb hilbijartin. Pîvana me ya hilbijartinê ew e ku nivîskar devokên herêmên xwe di romanên xwe de parastibin. Herçend di qada nivîsandinê de îroj berbihevvehatina devokan hebe jî, ji ber nebûna perwerdehiya zimên, bandora devokan hê jî di nivîsandinên van romannivîsan de xuya dibin. Romanên kurmaciyê yên ku em li ser wan xebitîn ev in :

Remezan Alan, *Saturn*, Avesta.

Hesenê Metê, *Labîrenta Cinan*, Welat.

Lokman Polat, *Fîlozof*, Helwêst.

Eyup Kiran, *Dewrêşê Evdî*, Sî.

Mehmed Uzun, *Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê*, Avesta.

Mehmed Uzun, *Bîra Qederê*, Avesta.

Adîl Zozanî, *Kejê*, Pêrî.

Îhsan Colemergî, *Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan*, Avesta.

Mezher Bozan, *Av zelal bû*, Pêrî.

Mustafa Aydoğan, *Pêlên bêrîkirinê*, Nûdem.

Mîran Janbar, *Ardûda*, Lîs.

Lokman Ayebe, *Jar lê Sermest*, Belkî.

Torî, *Mendik*, Berfîn.

Medenî Ferho, *Mîrze Meheme*, Nûdem.

Laleş Qaso, *Sê şev û sê roj*, Nûdem.

Mahmud Baksî, *Gundikê Dono*, Orfeus.

Kemal Orgun, *Li qeraxa şevê hîvron*, Sî.

¹⁰ Em dizanin ku zimanê devkî û yê nivîskî ne weke hev e. Lê, ji bo nuha, em li ser zimanê nivîskî dixebitin. Yek ji armancên vê xebatê jî ew e ku bi dû re li ser zimanê devkî jî heman modelê biceribîne.

2- Pirsgirêk

Me got ku ji bo naskirina demên zimanekî, mirov berê li rêzimanên wî zimanî dinihere. Lê belê, hejmara demên lêkeran di rêzimanên kurmanciyê û di xebatên ku di warî de hatine kirin de ne yek e. Heke ji bo demên kurmanciyê yên lêkeran em bala xwe bidin van rêzimanan û xebatan, em ê encamên jêrê bi dest bixin.

| | |
|----------------------------|----------------------------------|
| Bedirkhan et Lescot (1970) | : 17 demên lêkeran |
| Badilli (1965) | : 11 demên lêkeran |
| Sagnic (1991) | : 16 demên lêkeran ¹¹ |
| Jemo (1991) | : 29 demên lêkeran |
| Ciwan (1992) | : 18 demên lêkeran |
| Barnas (1993) | : 17 demên lêkeran |
| Rizgar (1993/2005) | : 12 demên lêkeran |
| Blau et Barak (1999) | : 16 demên lêkeran ¹² |
| Yalçin (2000) | : 21 demên lêkeran |
| Tan (2005) | : 27 demên lêkeran ¹³ |

Xebata Evîn Yalçin (2000) li ser şeş gramer û xebatên din hatiye kirin¹⁴. Yalçin di tevaya gramerên ku ew li ser xebitiye de 21 demên lêkeran peyda dike û, beyî ku li ser vê cudabendiyê pirsan ji xwe bike, dibêje ku hingê di kurmanciyê de 21 demên lêkeran hene.

Ji bo naskirina formên lêkeran ku di van lêkolîn û gramerên jorê de weke demên lêkeran hatine pejirandin, pêwîst e ku mirov bi tabloyekê wan bide ber hev. Em ê ji dêleva herşêş gramerên ku Yalçin li ser xebitiye, bi tenê encamên danberheva Yalçin (2000) bi kar bînin û em ê wan encaman bidin ber xebatên din.

¹¹ Li gora Yalçin, Feqî Husên Sagnic behsa 15 demên lekeran dike. Lê belê, Sagnic navê 16 deman dide. Ya ku Yalçin nahesibîne ew dem e ku Sagnic dibêje ku bi tenê ji bo lêkerên alîkar yên mîna *karîn*, *zanîn*, *vîn* û *wêrîn* tê bikaranîn. Em ê vegeirin ser vê mijara van lêkeran.

¹² Digel ku Blau û Barak (1999) şayesa şazdeh demên lêkeran dikin jî, ew, di tabloya xwe ya deman ya encamê de (r. 117), bi tenê navê navê sêzdeh heban didin.

¹³ Ya rastîn, Tan behsa 19 demên lêkeran dike. Lê belê, ew hin formên lêkeran bi gellek navên cuda ji nû ve şirove dike (demên bilanî, ên divêti û hwd.). Li gora van şiroveyan, em fahm dikin ku ew behsa 27 demên lêkeran dike. Em di tabloyê danberhevê de bi tenê behsa wan 19 deman dikin.

¹⁴ Yalçin li ser van grameran xebitiye : Bedirxan û Lescot, Rizgar, Ciwan, Blau û Barak, Badilli, Sagnic.

Tabloya demên lêkeran li gorî Jemo (1991), Yalçin (2000), Barnas (1993) et Tan (2005)¹⁵.

| Mînak | JEMO (1991) | YALÇIN (2000) | BARNAS (1993) | TAN (2005) |
|--------------------|----------------------------------|----------------------------------|----------------------------|----------------------------|
| Ez dikevim | dema nuha | dema niha | dema niho | dema niha |
| Ez dikevime | dema niha ya domdar | dema niha ya domdar | nihoya domdar | dema niha ya domdar |
| Ez hergav dikevim | | dema fireh | | dema fireh |
| Ez ê dikevim | | | | dema niha ya berbiçav |
| Ez ketim | dema boriya têdeyî | dema boriya têdeyî | raboriya sade | dema boriya têdeyî |
| Ez nuh ketim | dema bihuriya nêzîk | | | |
| Ez ketime | dema boriya dûdar | dema boriya dûdar | raboriya çîrokî | dema boriya dûdar |
| Ez diketim | çîrokiya dema nuha | raboriya berdest | raboriya berdest | dema boriya berdest |
| Ez diketime | çîrokiya d. nuhaya domdar | raboriya berdest a çîrokî | raboriya berdest a çîrokî | |
| Ez diketibûm | çîrokiya d. nuha a dûr | raboriya dûr a liserbûyinê | raboriya dûr a liserbûyinê | |
| Ez diketibûme | r. berdest a dûr û domdar | | | |
| Ez ketibûm | çîrokiya boriya têdeyî | çîrokiya boriya têdeyî | raboriya dûr | çîrokiya boriya têdeyî |
| Ez ketibûme | ç. boriya têdeyî a domdar | ç. b. têdeyî a nedîtîne | | çîrokiya boriya dûdar |
| Ez dikim bikevim | dema bê ya nêzîk | dema bê ya nêzîk | dahatiya nêzîk | dema bê ya nêzîk |
| Ez dikim bikevime | dema bê ya nêzîk û domdar | | | |
| Ez ê bikevim | dema bê | dema bê | dahatî | dema bê |
| Ez ê bikevime | dema bêya domdar | | | |
| Ez bikevim | dema nuhaya xwestekî | dema nihaya xwestekî | nihoya bilaniyê | dema nihaya xwestekî |
| Ez bikevime | d. nuhaya xwestekî û domdar | | | |
| Ez ketibim | dema bihuriya xwestekî | dema bihuriya xwestekî | | raweya merc û daxwazê |
| Ez ketibime | d.b. xwestekî û domdar | | | |
| Ez biketama | çîrokiya d. nuha a xwestekî | dema boriya mercî | raboriya bilaniyê | dema boriya xwestekî |
| Ez biketabûma | r.b. a dûr a xwestekî | | | |
| Ez ketibûma | çîrokiya xwestekî | dema boriya dûr mercî | raboriya dûr a bilaniyê | çîrokiya xwestekî |
| Ez ê ketibim | dema bihuriya mercî | dema bihuriya xwestekî(2) | | dahatiya pêş |
| Ez ê ketibime | dema bihuriya mercî a domdar. | | | |
| Ez dikira biketama | | d. bihuriya mercî a dahatiya pêş | | dema bêya nêzîk a xwestekî |
| Ez ê biketama | çîrokiya dema nuhaya mercî | dema boriya mercî (2) | raweya hekinî | dema bêya xwestekî |
| Ez ê biketabûma | çîrokiya dema nuhaya mercî û dûr | | | |
| Ez ê ketibûma | çîrok. boriya têdeyî a mercî | dema boriya dûr a mercî (2) | raweya hekinî (2) | dema bêya çîrokiya xwest |
| Bikeve | nuhaya raweya fermanî | raweya fermanî | raweya fermanî | raweya fermanî |
| Bikeveye | n. raweya fermanî a domdar | | | |

¹⁵ Em bi xwe navên demên Jemo (1991) û yên Yalçin (2000) werdigerînin kurmançî, ji ber ku ev lêkolîn bi zimanê fransî hatine kirin. r=raburdû, n=nuha, d=dem, ç=çîrokî.

Li gora vê tabloyê diyar dibe ku di kurmançiyê de em dikarin behsa 32 formên lêkeran bikin ku zimannasên kurd weke demên lêkeran dipejirînin¹⁶. Heke em li cudabendiya xebatan a di warê hejmara deman de jî biniherin, hingê em dibînin ku pirsgirêka destnîşankirin û şayesandina deman giringtir dibe. Ji ber ku di tu zimanan de 32 wext nîne. Lê belê, ev cudabendiya xebatan ji ku tê ?

Du hîpotezên me yê ji bo bersiva vê pirsê hene. Di van hîpotezan de hesabê nebûna perwerdehiya bi kurdî a li bakur jî hatiye kirin.

1-. Zimannasên kurd di bin bandora gramerên zimanên din de hin deman ji bo kurmançiyê jî ava dikin.

2- Hin dem di hin devokan de bi formên lêkeran yê cuda tên avakirin. Hingê, heke mirov hesabê cudahiyên devokan neke, mirov dikare bikeve wê baweriyê ku her formeke lêkeran demeke nuh ava dike. Weha xuya dibe ku zimannasên kurd, di vê mijarê de bi xemsaî tev geriyane.

3- Avakirina demên lêkeran di kurmançiyê de

Di kurmançiyê de demên lêkeran li gora rayên (radical, kök) lêkeran tên saz kirin. Di kurmançiyê du rayên lêkeran hene ku em ê ji wan re bibêjin (R1) û (R2).

Weke ku di Gramera Bedirxan û Lescot (1991) de tê gotin, ji bo avakirina deman divê mirov forma lêkeran ya raderîn (infinitif, mastar) û ya fermanî (impératif, ferman, emir) nas bike. Herweha, divê mirov bizane bê ew lêker gerguhêz (transitif, geçişli) e an na, ji ber ku di kurmançiyê de ergatîv heye û di demên bihurî de lêker li gora hejmara bireserê (object) tê kişandin¹⁷. (R1) ji fermaniya lêkeran tê peydakirin û (R2) ji raderîna wan. Ji bo peydakirina rayên lêkeran, divê qertafên dem û rawe û kesan ji formên lêkeran bîn avêtin.

Mînak (R1) : çûyin → biçe → -ç-

(R2) : çûyin → çû-

¹⁶ Em ê di vê xebatê de nekevin mijara cudabendiya termînolojiya ku di rêzimanên kurmançî de hatiye bikaranîn. Ji bo vê mijarê, em referansa lêkolîna xwe ya doktorayê didin. Aydogan (2006), *Temps, subordination et concordance des temps dans les romans kurdes* : étude descriptive sur le système verbal et la subordination temporelle en kurde, thèse de doctorat, Université de Rouen.

¹⁷ Ji bo vê mijarê, em disa referansa Gramera Bedirxan û Lescot (1991) û herweha ya Kamûran Bedirxan (1991) didin. Hirorî (2006) jî di vî warî de bi nêzîktêdayineke zelal behsa mijarê dike.

Heke, ji bo vê gavê, em sazkirina hemû demên lêkeran ku di grameran de hene nîşan bikin, em ê tabloyeke weke ya jêrê peyda bikin.

Tabloya sazkirina deman¹⁸

| Lêker : <i>ketin</i> | Dema lêkerê | Avakirina demê |
|----------------------|-------------------------------------|---|
| Ez dikevim | Dema nuha | di + R1 + K |
| Ez dikevime | Dema nuhaya domdar | di + R1 + K + e |
| Ez hergav dikevim | Dema nuhaya hercar | hergav di + R1 + K |
| Ez ê dikevim | Dema nuhaya berbiçav | ê di + R1 + K |
| Ez ketim | Dema bihuriya têdeyî | Ø + R2 + K |
| Ez nuh ketim | Dema bihuriya nêzik | nuh Ø + R2 + K |
| Ez ketime | Dema bihuriya dûdar | Ø + R2 + K + e |
| Ez diketim | çirokiya dema nuha | di + R2 + K |
| Ez diketime | çirokiya dema nuhaya domdar | di + R2 + K + e |
| Ez diketibûm | raboriya dûr a li ser bûyinê | di + R2 + bûyin (R2) + K |
| Ez diketibûme | raboriya dûr a liserbûyinê û domdar | di + R2 + bûyin (R2) + K + e |
| Ez ketibûm | çirokiya bihuriya têdeyî | Ø + R2 + bûyin (R2) + K |
| Ez ketibûme | çirokiya bihuriya têdeyî a nedîtîne | Ø + R2 + bûyin (R2) + K + e |
| Ez dikim bikevim | Dema bê ya nêzik | kirin (nuha) + bi + R1 + K |
| Ez dikim bikevime | Dema bê ya nêzik û domdar | kirin (nuha) bi + R1 + K + e |
| Ez ê bikevim | Dema bê | ê bi + R1 + K |
| Ez ê bikevime | Dema bêya domdar | ê bi + R1 + K + e |
| Ez bikevim | Dema nuhaya xwestekî | bi + R1 + K |
| Ez bikevime | Dema nuhaya domdar a xwestekî | bi + R1 + D + e |
| Ez ketibim | Dema bihuriya xwestekî | Ø + R2 + bûyin (R1) + K |
| Ez ketibime | Dema bihuriya domdar a xwestekî | Ø + R2 + bûyin (R1) + K + e |
| Ez biketama | çirokiya dema nuha a xwestekî | bi + R2 + K + a |
| Ez biketabûma | ç. dema nuha ya xwestekî a dûr | bi + R2 + K + bûyin (R2) + K + a |
| Ez ketibûma | çirokiya bihuriya têdeyî a xwestekî | Ø + R2 + bûyin (R2) + K + a |
| Ez ê ketibim | Dahatiya dema bê | ê Ø + R2 + bûyin (R1) + K |
| Ez ê ketibime | Dahatiya dema bê | ê Ø + R2 + bûyin (R1) + K + e |
| Ez dikir biketama | Dema bêya nêzik a xwestekî | kirin (çirokiya nuha) + bi + R2 + K + a |
| Ez ê biketama | çirokiya dema nuhaya mercî | ê bi + R2 + K + a |
| Ez ê biketabûma | çirokiya dema nuhaya mercî û dûr | ê bi + R2 + bûyin (R2) + K + a |
| Ez ê ketibûma | dema bihuriya mercî | ê Ø + R2 + bûyin (R2) + K + a |
| Bikeve | Fermanî | bi + R1 + K |
| Bikeveye | Fermaniya domdar | bi + R1 + K + e |

¹⁸ (K) bi wateya *qertafa kesane* hatiye bikaranîn. Em ji bo mînakên, lêkera « ketin » bi kar tînin.

Li gora vê tabloyê, em dikarin hin taybetmendiya demên kurmanciyê ên ku ji aliyê zimannasên kurde hatine şayesandin bi vî awayî destnîşan bikin :

- *Dema nuha ya hercar* bi alîkariya hokera “hergav” hatiye avakirin. Ev dem bi tenê di xebata Mûrad Ciwan (1992) de heye. Heman taybetmendiya hokeran di avakirina *dema bihuriya nêzîk* de jî heye. Ev dem jî bi alîkariya hokera “nuha” ve hatiye avakirin û di rêzimana Qanatê Kurdo û herweha di ya Jemo (1991) de jî heye. Rast e ku hin hoker alîkariya naskirina pevajodema bûyeran dikin, lê ew tucarî demên nuh ava nakin. Heke ne weha bûya, diviya ku me ji bo her hokereke deman demeke lêkeran ya nuh peyda bikiraya. Lewra, heke em bibêjin ku “*ez nuh hatim*” demeke serbixwe ye, hingê dive em bibêjin ku “*ez ê nuh derkevîm*” jî demeke serbixwe ye. Li gora me, Ciwan di bin bandora « geniş zaman »a tirkî de ye û Jemo û Kurdo jî di bin bandora « passé récent »a fransî de ne.

- *Dema nuha ya berbiçav* di xebata Akrawy (1982) û di ya Tan (2005) de heye. Ev dem bi alîkariya daçeka /ê/ hatiye avakirin. Lê belê, Blau û Barak (1999) dibêjin ku ev daçek, li derdora Mereş, Meletî û Entabê, di avakirina dema nuha de tim tê bikaranîn¹⁹. Ew dibêjin ku daçeka /î/ ji bo navên nêr û daçeka /ê/ jî ji bo navên mê, piştî kirdeyê tên bikaranîn. Hingê dive mirov vê demê di çarçoweya cudahiyên devokan de binirxîne û weke demeke serbixwe nepejirîne.

- Lêkera “*kirin*” di avakirina sê demên lekeran de weke lêkera alîkar hatiye bikaranîn. Herdu demên din bi rêya nirxandina “*dema bê ya nêzîk*” ve ketine nava rêzimanên kurmanciyê. Murad Ciwan (1992) bi bandora zimanên ewropî yên weke fransî ku vê demê nas dikin, ev dem ji bo kurmanciyê jî şayesandiyê. Lê belê, gava ku em bibêjin “*dema bê*”, hingê dive bûyera ku tê ravekirin weke ku dê di dema bê de pêk were bê diyarkirin. Di mînaka « *ez dikim bikevim* » de dema bûyerê ne li ser lêkera *ketinê* ye, lê belê li ser *kirinê* ye. Dibe ku « *ez* » nekeve jî. Ramana *dema bê* di vê mînakê de ne zelal e. Heke em weha nebêjin, divê em mînaka « *ez dixwazim biçim* » jî weke dema bê bipejirînin. Lê heke em li mînaka « *ez dikir biketama* » biniherin, em ê fahm bikin ku *ketin* dê pêk neyê. Hingê mirov nema dikare jê re bibêje « *dema bê* », ji ber ku ramana *dema bê* tê de xuya nabe. Em ê vegerin ser mijara « *dema bê ya nêzîk û domdar* ».

- Ew demên ku zimannasên kurd ji wan re dibêjin « demên domdar » (duratif) li gora me nêzîktêdayîneke hûrbijar pêwîst dikin. Em ê di beşekî serbixwe de behsa vê mijarê bikin.

¹⁹ Blau et Barak (1999), r. 47.

3.1- Demên domdar

Di tabloya me ya deman de neh demên domdar xuya dibin. Ev hemû dem bi qertafa /-e/ hatine avakirin. Li gora Samî Tan (2005), di dema nuha de, « ev deng wateya domdariyê dide lêkerê »²⁰. Lê belê, Blau û Barak (1999) ji bo vê qertafê dibêjin ku ev qertaf bi lêkerên *tevgerî* (verbe de mouvement) ve tê bikaranîn²¹.

Ka em van demên « domdar » (duratif) bi hin demên ku dişibin wan re bidin ber hevdu :

Tabloya demên domdar

| Demên lêkeran | | | Domdariya wan |
|---------------------------------|------------------|-------------------|---|
| Dema nuha | Ez dikevim | Ez dikevime | Dema nuha ya domdar |
| Çîrokiya dema nuha | Ez diketim | Ez diketime | çîrokiya d. nuha ya domdar |
| Raboriya dûr a li ser bûyinê | Ez diketibûm | Ez diketibûme | raboriya dûr a li ser bûyinê û domdar |
| Dema bê ya nêzik | Ez dikim bikevim | Ez dikim bikevime | Dema bê ya nêzik û domdar |
| Dema bê | Ez ê bikevim | Ez ê bikevime | Dema bê ya domdar |
| Dahatiya dema bê | Ez ê ketibim | Ez ê ketibime | Dahatiya dema bê a domdar |
| Dema nuha ya xwestekî | Ez bikevim | Ez bikevime | Dema nuha ya domdar a xwestekî |
| Dema bihurî ya xwestekî | Ez ketibim | Ez ketibime | Dema bihurî a domdar a xwestekî |
| Fermanî | Bikeve | Bikeveye | fermaniya domdar |

Gava ku em bala xwe didin mînakan, em dibînin ku cudahiya demeke lêkeran û dema wê ya domdar ew e ku di dema domdar de qertafa /-e/ heye.

Li gora me, ev fenomen jî divê di çarçoweya cudahiya devokan de bê nixandin. Ji bo fahmkirina vê forma lêkerê, em li hin mînakên ku me ji romanên kurmancî wergirtin binîherin. Bi vî awayî em ê bikaranîna vê qertafê fahm bikin :

- (2) a) Min baş bihîst ku ji min re wusa **got**. b) Peyvik bi peyvik... rasterast weha **gote min**: (*Labîrenta Cinan*, p. 168).

²⁰ Tan (2005), r. 236.


²¹ Blau û Barak (1999), r. 60.

- (3) Wexta **hate** Gundê Aftinîgê, notirvan dukana xwe hê venekiribû. (*Li qeraxa şevê hîvron*, p. 17)
- (4) Wexta ku bavê min vegeziya **hat**, ronahî ne pê re bû. (*Li qeraxa şevê hîvron*, p. 77)

Gava ku em bala xwe bidin van mînakên, em ê bibînin ku dema lêkeran *dema bihurî ya têdeyî* de. Forma lêkerê ya ku em di (2b) û (3) de dibînin ji aliyê gramerên kurmancî ve weke demeke serbixwe nehatiye pejirandin, ji ber ku, weke ku Samî Tan jî dibêje, di *dema bihuriya têdeyî* de, « gellek çaran çinavka pêvebestî derdikeve pêşberî mirov »²². Tan weha dide fahmkirin ku bikaranîna vê qertafa /-e/ tu guhertinê di demê de pêk nayne. Weke ku em di (2a) de dibînin, bikaranîna wê herweha ne mecbûrî ye. Gramera Bedirxan û Lescot (1991) jî heman fenomena vê demê ji berê de destnîşan kiribû²³. Samî Tan (2006) mînakên mîna « *Ew hate bajêr* » û « *Ew gihîşte gund* » dide û dide fahmkirin ku mirov dikare bibêje « *Ew hat bajêr* » û « *Ew gihîşt gund* » jî.

Li gora me, di van mînakên de bikaranîna peyvên « bajêr » û « gund » divê bala me bikişîne. Heke em van herdu peyvên ji mînakên Samî Tan biavêjin, em ê herweha wê qertafa /-e/ jî biavêjin, ji ber ku di kurmancî de em nikarin di *dema bihuri ya têdeyî* de bibêjin « *Ew hate* » an jî « *Ew gihîşte* ». Hingê, mirov divê bibêje ku beyî navê çihê ku bûyer ber bi wê ve diherike, mirov nikare qertafa /-e/ bi kar bîne. Hingê ev qertaf berê bûyerê nîşan dide û bi tenê bi *lêkerên berpêbûyinê* (directionnel) ve tê bikaranîn.

Ji ber wê, pêşkêşiya mînakên me (2), (3), (4) û mînakên Samî Tan dê li gora modela pêvajodemkî weke hev be :



Zimannasên kurd ku dizanin ku ev qertaf tu guhertinê di *dema bihurî ya têdeyî* de nake û bi devokan ve têkildar e, gava ku dor tê ser demên din, weha didin xuyakirin ku guhertinek bi vê qertafê peyda dibe, ji ber ku ew *dema bihurî ya têdeyî* gellekî dibihîsin û


²² Tan (2005), r. 242.

²³ Bedirxan û Lescot (1991), r. 137.

nas dikin. Lê gava ku ew heman qertafê li pey demeke din dibînin, dibêjin qey demeke serbixwe peyda dibe. Em dikarin li hin mînakên demên ku ew dikin « domdar » jî biniherin. Bi vî awayî em ê bibînin ku ev qertaf, weke *dema bihurî ya têdeyî*, bi tenê ji bo berê bûyerê nîşan bide tê bikaranîn.

- (5) Qewîtîyên xwe bi gundiyan ko **diçûne** bajar dianî cih. (*Mendik*, p. 195)
- (6) Ez ji bo konferansekê **diçûme** Axsorê. Li balafirgehê li wî rast hatim. (*Ardûda*, p. 32)
- (7) Yên ku **diçûn** bajêr bi taybetî pirs dikirin ji dikanan û qehwên Milla lê rûdiniştin û bazirganî dikirin. (*Dewrêşê Evdî*, p. 183)
- (8) Havînan em **diçûn** gund. (*Bîra Qederê*, 157)

Heke em bala xwe bidin van mînakên jorê, em ê bibînin ku her mijara lêkerên berpêbûyinê ye û bikaranîna qertafa /-e/ li gora nivîskaran tê guhertin. Lê belê, weha tê fahmkirin ku bikaranîna wê wateya demê qet naguherîne. Ev qertaf bi tenê lêkera ku tê bikaranîn bi berê wê ve girê dide. Pêşkêşiya van herçar bûyeran li gora modela pêvajodemkî dê dîsa yek be.



Li gora romanên ku em li ser wan xebitîne, ev qertaf bi tenê bi lêkerên berpêbûyinê (directionnel) re tê bikaranîn, da ku berê bûyeran nîşan bide. Lêkerên mîna *çûyin*, *hatin*, *ketin*, *avêtin*, *gotin*, *rijandin*, *gihîştin*, *derketin* û hwd. dikevin nava grûba van lêkerên ku tim navnîşana encama bûyerê jî pêwîst dikin. Di romanên de me nedît ku tu lêkerên din, ji bilî lêkerên berpêbûyinê, dikarin bi vê qertafê re bînin bikaranîn.

Hingê, bikaranîna vê qertafê bi tenê bi qereqtera grûbeke lêkeran ve têkildar e û nikare ji bo lêkerên din bê bikaranîn. Di vê rewşê de, mirov nikare qertafa /-e/ weke avakirê demên xweser binirxîne. Ji ber vê sedemê, li ser wan neh demên ku zimmanasên kurd weke

« domdar » dipejirînin, em gihîştin wê encamê ku em nikarin van formên lêkeran weke demên lêkeran bipejirînin.

Bi vî awayî em heta nuha li dijî 14 deman derketin ku di xebatên ku li ser kurmanciyê hatine kirin de weke demên lêkeran ên xweser hatine destnîşankirin.

3.2- Demsaziya lêkerên marjînal

Nuha jî em ê behsa hin lêkeran bikin ku kurmancan li ser bikaranîna wan li hev nekiriye. Ji ber wê em ê ji wan re bibêjin lêkerên marjînal.

Di kurmanciyê de hin lêker hene ku ji bo demsaziya wan mirov nikare formuleke zelal peyda bike, ji ber ku li her deverê bi awayekî tîk bikaranîn. *Zanîn, vîn, karîn û wêrîn* ew lêker in ku di nava van lêkeran de herî pir tîk naskirin. Ji ber ku bi gellek awayan tîk bikaranîn jî, em ji wan re dibêjin lêkerên marjînal.

Ev lêker dikarin ji bo bûyerên din jî weke lêkerên alîkar bînin bikaranîn. Taybetmendiyê van lêkeran heye ku nikarin di *dema bihurî ya têdeyî* de bînin bikaranîn. Di 17 romanên kurmacî de me bi tenê du mînakên wê demê bi van lêkeran peyda kirin. Dibe ku ev dem ji bo van lêkeran jî berê hebû, lê îroj em dizanin ku di zimanê devkî de nemaye û di yê nivîskî de jî pir kême heye. Em ê ji bo van lêkeran lêkera *zanîn* weke mînak bigirin û bala xwe bidinê bê di romanên kurmacî de bi çend awayan dikare demekê bi tenê ava bike.

Ji bo *çîrokiya dema nuha* çar formên lêkera *zanîn* ji bo kesê sêyem ê yekhejmar di romanên kurmacî de peyda dibin :

- **dizanî**
- **zanîbû**
- **dizaniya**
- ***dizanîbû (dizanî bû)***

Ev forma dawîn ji aliyê zimannasên kurd ve weke *dema bihuriya dûr a li ser bûyinê* hatiye binavkirin û weke demeke xweser hatiye destnîşankirin, digel ku ev form jî bi wateya hersê formên din tê bikaranîn.

Me ji bo *çîrokiya dema nuha ya xwestekî* jî, di romanên kurmancî de, sê formên vê lêkerê peyda kirin :

- **bizaniya**
- **zanîba** (*zanîbûya*)
- **bizanîbûya**

Ev forma sêyem weke *çîrokiya dema nuha ya xwestekî ya dûr* hatiye binavkirin û weke demeke lêkeran ya xweser hatiye destnîşankirin. Lê belê hersê form jî heman ramana pevajodemkî rave dikin.

Ji bo *çîrokiya dema nuha ya mercî* jî, me dîsa du formên cuda yên lêkera *zanîn* di romanên kurmancî de peyda kirin :

- **ê bizaniya**
- **ê bizanîbûya**

Ev form yan bi armanca ravekirina *dema bê ya dema diburî* (futur du passé), yan jî di avahiyên mercî de tîkî bikaranîn. Digel ku herdu form jî heman wateya pevajodemkî didin bûyerê, ev forma duyem ji aliyê zimannasên kurd ve weke demeke lêkeran ya xweser hatiye hesabandin.

Bi vî awayî, hejmara demên lêkeran ên ku em li dijî wan derdikevin, dibe 17. Hingê, ji 32 demên lêkeran ên ku gramerên kurmancî behsa wan dikin, bi tenê 15 heb dimîne di destê me de. Lê belê hejmara demên lêkeran ên ku me di romanên kurmancî de dîtî ne 15 ye. Em ê nuha jî behsa demên medyatîf bikin ku zimannasên kurd ew weke kategoriyeke cuda nehesibandine.

3.3- Medyatîf

Medyatîf ew awayê ravekirina bûyeran e ku ne weke demên lêkeran ên din behsa bûyeran dike. Gava ku lêkerê bi formeke medyatîfê hatibe bikaranîn, dema pêkhatina bûyera ku ew lêker rave dike ne diyar e. Ev kategoriya ku di hemû zimanan de heye, di her zimanekî de bi awayekî cuda tê ravekirin²⁴. Gellek zimanan, fransî jî yek ji wan e, ev kategoriya formên lêkeran gramatize nekiriye, lê di kurmanciyê de, qertafa /-e/ ji bo avakirina vê kategoriyê li hin deman tê zêdekirin û medyatîfê ava dike.

Zlatka Guentchéva (1994) û (2004) diyar dike ku medyatîf ji bo xalên jêrê tê bikaranîn :

1. Agahiyên ku ji hinin din ve hatine bihîstin (ouï-dire)
2. Agahiyên ku bi rêya delîlan ve diyar dibin (inférence)
3. Di rewşa heyraniya li hember tiştekî ku axavker nuh kişf dike (admiration)
4. Gava ku bandora bûyerê li ser dema axavtinê jî hebe (effet prolongé)

Di ravekirina van celebên agahiyên de, axavker ji medyatîfê destkewtî dibe. Bi pirranî, di medyatîfê de armanc ew e ku bibêje ku axavker ne şahidê wê bûyerê ye ku ew rave dike. Weke ku Guentchéva dibêje, erê di hemû zimanan de ev nêzîktêdayina bûyeran heye, lê belê, hemû ziman ji bo vî awayê dîtina bûyeran formên cuda û xweser ava nakin²⁵. Kurmancî yek wan zimanan e ku medyatîfê bi formeke cuda destnîşan dike.

Ji bo têgihîştineke baştir, em hinan mînakên bidin :

- (9) Xwelî li sero tu jî zîlam î. (...) Lêbelê ez çî bikim ji wî Xwedayê ku tu nêr û ez jî mê **çêkirime**... (*Sê şev û sê roj*, p. 26)
- (10) a) - Gelo te şîv **xwariye**? (...)
b) - Min **xwariye**, spas. Ez têr im. (*Jar lê Sermest*, p. 19)

Di mînaka (9) de, herçend bûyera *çêkirinê* di demeke bihurî de pêk hatibe jî, agahiya ku lêkera wê bi me dide fahmkirin bi tenê li ser bandora vê bûyerê ye. Ev bandor li ser dema ku axavker diaxive ye. Em dizanin ku bûyera « çêkirin » bi dawî bûye, lê şopa wê didome û dikare di dema axavtinê de jî bê dîtin, ji ber ku yê ku hatiye çêkirin hê jî heye. Hingê, di vê

²⁴ Guentchéva (2004), r. 25.

²⁵ Guentchéva (2004), r. 25.

medyatîfê de, dem bi awayekî zelal nîn be jî, bandora bûyerê heye û ev bandor li ser *dema nuha* ya axavker e.

Di mînakê (10) de rewşeke din xuya dibe. Di (10a) de axavker behsa bûyereke dîke ku wî bi xwe nedîtîye. Bûyera « xwarinê » ji aliyê axavkerê (10b) ve hatiye kirin. Lê belê ew pêwîst nabîne ku dema wê bibêje û vê bûyerê weke « min xwar » rave bike. Cudabûna van herdu forman ew e ku di medyatîfê de bandora bûyerê li ser dema axavtinê heye. Heke bibêje « min xwar », em ê bizanin ku « wî xwar », lê em ê nizanibin bê ew birçî ye an na. Lê heke bibêje « min xwariye », em ê zelaltir fahm bikin, ji ber ku axavker, gava ku dibêje « min xwariye », herweha dibêje « ez têr im », an jî « pêdiviya min bi xwarinê nîne ». Bi gotineke din, bandora vê « xwarinê » di dema ku ew dipeyive de jî diyar e, ji ber ku « ew têr e ». Weke ku bibêje « Min Parîs dîtîye », yanî « hewce tune ye ku nuha ji min re behsa wê bibe ».

Gava ku em bala xwe didin sazkirina medyatîfê, em dibînin ku cudahiya vê *dema bihurî* ya *medyatîfê* ji *dema bihurî* ya *têdeyî* ew e ku qertafa /-e/ pê ve ye. Hingê, axavker bi bikaranîna medyatîfê bi awayekî din nêzikî bûyerê dibe. Ji ber wê, divê ev forma lêkeran ji demên lêkeran ên din cuda bête nixandî. Em ê ji vê demê re bibêjin *dema bihurî* ya *medyatîfê*. Ev forma lêkeran di hemû rêziman û xebatên li ser demên kurdî de heye, lê belê, binavkirina wê û şayesa wê bi awayekî zelal nehatibû kirin.

Heke em, li gora tabloya me ya deman, li *çîrokiya dema bihurî* (ez ketibûm) û *çîrokiya dema bihurî* ya *nedîtinê* (ez ketibûme) jî biniherin, em ê bibînin ku her ew cudahî ye. Di *çîrokiya dema bihurî* ya *nedîtinê* de dîsa qertafa /-e/ heye û ev qertaf medyatîfê ava dîke. Em ê bi mînakên jêrê bibînin ku mesele ne bi tenê « nedîtin » e, lê weha be jî, « nedîtin » a bûyerê ya ji hêla axavkêr, dikeve nava kategoriya medyatîfê. Hingê, em ê ji vê forma lêkerê re jî bibêjin *çîrokiya dema bihurî* ya *medyatîfê*.

Ev forma lêkeran di xebata Sagniç (1991), Ciwan (1992), Yalçın (2000) û Tan (2005) de heye, lê belê di nava kategoriyên din de hatiye şayesandin û weke forma *nedîtinê* hatiye destnîşankirin. Lê belê, weke ku me got, mirov nikare bikaranîna vê formê bi bûyerên ku nehatiye dîtin ve bi sînor bike, ji ber ku hin bikaranînên wê yên din jî hene ku mînakên wê di romanên kurmancî de hene. Mînakê jêrê dê di vî warî de alî me bike :

- (11) a) **Digotin**, b) wê çaxê kurê wî gelekî *şerm kiriye*, c) *xwe havêtiye* dest û lingên wî d) ku ew dev ji vî xwiyê xwe **berde**. e) Lê ne *bûye*... f) ev

xwiyê ha ji ser *ne çûye*. g) Evîneke asimanî **girti bûye** ser. (*Labîrenta Cinan*, p. 24)

Gava ku em bala xwe didin vê mînakê, em herdu formên medyatîfa kurdî jî bi awayekî zelal dibînin. Herdu lêkerên (11b), (11c), (11e) û (11f) bi *dema bihurî ya medyatîfê* ve hatine saz kirin. Weke ku em di (11a) de dibînin, ev bûyer ji hinin din ve hatine bihîstin û kesê ku bihîstiyê jî ji nû ve ji hinin din re dibêje. Ji ber ku axavker ne şahidê van bûyeran e, ew wan bi *dema bihurî ya medyatîfê* ve rave dike. Heke armanca medyatîfê bi tenê destnîşankirina *nedîtinê* be, hingê gelo ji bo çî lêkera (11g) bi formeke cuda hatiye saz kirin? Bûyerên din jî nehatine dîtin, hingê divê em formên din jî bi heman navî bi nav bikin. Gava ku em baş bala xwe bidin (11g), em ê bibînin ku di navbera vê bûyerê û bûyerên din de kronolojiyê demkî jî heye. Ev bûyer berî hemû bûyerên din pêk hatiye. Ji ber ku, ji bo ku « ev xwiyê ha » bi bavê lêwîk re peyda bibe, divê, berî wê, tiştekî nebaş were serê bêv. Ev bûyera ku dê bike ku « ev xwiyê ha » bigire ser bêv, bi (11g) ve hatiye rave kirin. Hingê, « nedîtin » di hemû mînakên de heye, ji ber ku axavkêr ji hinin din bihîstiyê, lê belê, dîsa jî bûyer tevna xwe ya kronolojîk diparêzin. Em digihêjin wê encamê ku *çîrokiya dema bihurî ya medyatîfê*, ji bo destnîşankirina bûyerên ku berî *dema bihurî ya medyatîfê* pêk tên, tê bikaranîn. Herweha, ev forma medyatîfê bi tenê di wê rewşê de tê bikaranîn ku gava ku yek axavtinê yekî din rave dike. Di romanên kurmançî de me nedît ku ji bilî vê rewşê ev form tê bikaranîn.

Di kurmançiyê de formeke medyatîfê ya sêyem jî heye ku ji aliyê tu zimannasên kurd ve weke formeke xweser nehatiye destnîşankirin. Li gora me, sedema vê yekê jî têra xwe zelal e. Ev forma medyatîfê ya ku zêde nayê bikaranîn, bi tenê bi lêkerên *bûyin* û *hebûn* ve tê bikaranîn. Me ji bilî van herdu lêkeran tu mînakên din ji bo vê formê nedîtin.

Ev form ji *çîrokiya dema nuha* (ew hebûn) bi rêya lêzêdekirina qertafa /-e/ (ew hebûne) peyda dibe. Em ê ji vê forma lêkeran re bibêjin *çîrokiya dema nuha ya medyatîfê*.

- (12) a) **Bi gotîna wî** peyayên Kose Weys **bûne**. b) Kose Weys ew **şandine**.
c) Nêzîka nod siwarî **bûne**. (...) d) Gelek car **avêtine** ser êzîdiyan.
(*Dewrêşê Evdî*, p. 160)

Ger em bala xwe bidin vê mînakê, em ê bibînin ku du caran lêkera « bûyin » hatiye bikaranîn. Rewş heman rewş e. Axavker peyvên kesekî din ji nû ve rave dike. Digel ku ji bo lêkerên din *dema bihurî ya medyatîfê* hatiye bikaranîn, ji bo lêkera bûyinê, *çîrokiya dema nuha ya medyatîfê* hatiye bikaranîn.

Mirov dikare bibêje ku lekerên « bûyin » û « hebûn » di *dema bihurî ya medyatîfê* de bi vî awayî têne bikaranîn (ew bûye mamoste), ji ber ku ev herdu lêker bi tu awayên din nikarin ji bo *dema bihurî ya medyatîfê* bêne kişandin. Lê belê, heke em bala xwe bidin bûyera ku bi vê lêkera « bûyin »ê ve hatiye ravekirin, em ê bibînin ku taybetmendiye wê ji yên din cuda ne.²⁶

Di romanê de peyayên Kose Weys tên û bi axavkêr re dipeyivin. Yê ku bi axavkêr re peyiviye, ji wî re gotiye « em peyayên Kose Weys in ». Ma gelo, çima axavkêr nabêje « peyayên Kose Weys bûn » û hewce dibîne ku qertafa /-e/ lê zêde bike ? Bi ya me, ev bûyer referansa xwe ya demê ji dema wan peyayan a axavtinê werdigire. Bê şik, axavkêr ew peya dîtine û rastî û nerastiya hejmara peyayên Kose Weys jî dikare bê piştrastkirin, lê belê taybetmendiyeke din jî heye ku, li gora me, ji ber vê sedemê axavkêr qertafa /-e/ lê zêde dike. Peyva ku dibêje « bi gotina wî », divê di vî warî de hebekî bala me bikişîne. Her cara ku ev form di romanên kurmanciyê de hatiye bikaranîn, me bala xwe dayê ku, bi awayekî zelal an jî nezelal, tim du axavtin di mînakê de hene. Axavkêr tim axavtina yekî din rave dike. *Çîrokiya dema nuha ya medyatîfê* jî di vê rewşê de tê bikaranîn, lê belê bikaranîna wê, bi qasî ku me dît, bi hin herêmên weke Ezexê, Kerboranê û Ferqînê ve tê naskirin.

Ka em li mînakeke din binihêrin :

- (13) a) Gelek jinên pêxemberê me jî **hebûne**, hemû jî hipûhelal!... b) û dema ku bi hezretî Eysê re **zewuciye**, c) salên wî jî di ser penceyî re **bûne**...
Labîrenta Cinan, p. 59)

Mînaka (13a) bi awayekî zelal eşkere dike ku ev agahî ji hinin din hatiye stendin. Bûyerên (13a) û (13c) ne bûyerên sereke ne, ew rewşeke dema bihurî diyar dikin. Bûyera « zewac » (13b) di nava vê atmosfera ku bi van herdu bûyeran ve hatiye şayesandin de pêk

²⁶ Ew bûye mamoste û Ew mamoste bûye, di kurmancî de ne weke hev in. Di mînaka yekem de, guhertina rewşekê ber bi rewşeke din ve heye. Lê di ya duyem de, ew rewş di guhertinekê re derbas nabe.

hatiye. Ji ber ku awayê bikaranîna *dema bihurî ya medyatîfê* û *yê çîrokiya dema nuha ya medyatîfê* ne yek e, em pêwîst dibînin ku wan ji hev cuda bikin.

Bi vî awayî, em gihîştin wê encamê ku di medyatîfa kurdî de sê form hene. *Dema bihurî ya medyatîfê, çîrokiya dema bihurî ya medyatîfê* û *çîrokiya dema nuha ya medyatîfê*. Ev herdu demên dawîn, bi tenê di rewşa ravekirina axavtinên hinin din de tîn bikaranîn. *Çîrokiya dema nuha ya medyatîfê* herweha bi tenê ji bo lêkerên «bûyin» û «hebûn» tê bikaranîn.

4. Encam

Me bi vê lêkolînê destnîşan kir ku rêzimanên kurmanciyê bi bandora rêzimanên biyanî hin dem ji bo kurmanciyê jî şayesandine. Em li dijî van deman derketin :

dema nuha ya hercar
dema nuha ya berbiçav
dema bê ya nêzîk
dema bê ya nêzîk û domdar
dema bê ya nêzîk a xwestekî

Me herweha destnîşan kir ku hin demên hin lêkeran dikarin di hin devokên kurmanciyê de formên cuda ava bikin. Herçî ev lêker in, me ji wan re got «marjînal». Lêkerên *mîna zanîn, vîn, karîn* û *wêrîn* dikevin nava vê grûba lêkeran. Ev lêker ji bo demeke lêkeran dikarin gellek forman ava bikin. Me nîşan da ku, herçend ew formên cuda bin jî, ew her heman demê ava dikin. Heke mirov cudahiya devokan nehesibîne, mirov dê bibêje qey demên cuda yên xweser hene. Zimannasên kurd jî weha kiribû. Ji ber wê, em li dijî van hersê formên ku di rêzimanan de weke demên xweser hatibûn şayesandin derketin :

çîrokiya dema nuhaya mercî û dûr
çîrokiya dema nuha ya xwestekî a dûr
raboriya dûr a li ser bûyinê

Li ser neh demên «domdar», me got ku, li gora romanên kurmanciyê, di kurmanciyê de demên domdar tunene û ew formên ku hin zimannasên kurd dibêjin qey domdar in, bi tenê ji ber taybetmendiya hin lêkeran ve tê. Ev ew lêker in ku destnîşankirina navnîşana encamî a bûyerê pêwîst dikin. Em ji wan re dibêjin *lêkerên berpêbûyinê* (verbes directionnels). Ev lêker bi qertafa /-e/ bi navnîşana xwe ve tîn girêdan. An jî, bi gotineke din, ev qertaf berê

bûyera lêkerê nîşan dide. Lê, me got ku ev qertaf demên xweser ava nake. Hejmara demên ku bi vî awayî hatine şayesandin neh e.

Hingê hejmara demên ku em li dijî wan derketin dibe 17 û ji 32 deman, di destê me de 15 dem man. Teva *çîrokiya dema nuha ya medyatîfê*, ku di rêzimanên kurmanciyê de xuya nedibû, hejmara demên ku em bi vî lêkolînê, li gora romanên kurmanciyê, destnîşan dikin, digihîje 16'an.

Çavkaniyên teorîk :

ARISTOTE.- *Poétique* (introduction, traduction nouvelle et annotation de Michel Magnien).- Paris : Le livre de Poche, 2003.- 216 p.- (Collection « Classiques de Poche »).

ARISTOTE.- *Traité du Temps, Physique*, livre IV, 10-14 (introduction, traduction et commentaire par Catherine Collobert).- Paris : Kimé, 1994.- 124 p.- (Collection « Philosophie-épistémologie »).

COMBETTES Bernard (1994).- « Subordination, formes verbales et opposition des plans » in *Verbum*, n°1, pp. 5-22.

DE SAUSSURE Louis (1997).- « Le temps chez Beauzée : algorithmes de repérage, comparaison avec Reichenbach et problèmes théoriques » pp. 171-196 in *Cahiers Ferdinand de Saussure*, revue suisse de linguistique générale, n° 49, 1995-1996.

FRANÇOIS Jacques (2003).- *La prédication verbale et les cadres prédictifs*.- Louvain-Paris : Peeters.- 417 p.- (Collection « Bibliothèque de l'Information Grammaticale », 54).

GOSSELIN Laurent (1996).- *Sémantique de la temporalité en français* : Un modèle calculatoire et cognitif du temps et de l'aspect.- Louvain-la-Neuve : Duculot.- 291 p.- (Col. Champs linguistiques, dirigée par WILLEMS Dominique & WILMET Marc).

GOSSELIN Laurent (1999).- « La cohérence temporelle : contraintes linguistiques et pragmatico-référentielles » in *Travaux de Linguistique*, n° 39, pp.11-36.

GOSSELIN Laurent (2005).- *Temporalité et modalité*.- Louvain-la-Neuve : Duculot.- 254 p.- (Col. Champs linguistiques, dirigée par WILMET Marc et MELIS Ludo).

GUENTCHEVA Zlatka (1994).- « Manifestations de la catégorie du médiatif dans les temps du français » in *Langages*, n° 102. pp. 8-23.

GUENTCHEVA Zlatka (2004).- « La notion de médiation dans la diversité des langues » pp. 11-33 in DELAMOTTE-LEGRAND (dir).- *Les médiation langagières* : des faits de langue aux

- discours, vol. I, Actes du colloque international, la médiation : marquage en langue et en discours.- Rouen : Publication de l'Université de Rouen, DYALANG, CNRS.- 427 p..
- GUILLAUME Gustave (1968).- *Temps et Verbe* : théorie des aspects, des modes et des temps, suivi de *l'Architectonique du temps dans les langues classiques*- Paris : Librairie Honoré Champion.- 134+66 p.
- KLUM Arne (1961).- *Temps et adverbe* : étude sur le système verbal indicatif et sur le système de certains adverbes de temps à la lumière des relations verbo-adverbiales dans la prose du français contemporain.- Stockholm, Göteborg, Uppsala : Almqvist & Wiksell.- 313 p..
- KOZLOWSKA Monika (1998).- « Aspect, modes d'action et classes aspectuelles » pp. 101-121 in MOESCHLER Jacques (sous la direction de).- *Le temps des événements* : Pragmatique de la référence temporelle.- Paris : Kimé.- 348 p..- (Publié avec l'appui du Fond national suisse de la recherche scientifique).
- MOESCHLER Jacques (1993).- « Aspects pragmatiques de la référence temporelle : indétermination, ordre temporel et inférence » in *Langages*, n° 112, pp. 39-54
- MOLENDIJK Arie (1985).- « Point référentiel et imparfait » in *Langue Française*, n° 67, pp. 78-94.
- PINCHON Jacqueline (1969).- « Problèmes de classification : les adverbes de temps » in *Langue Française*, n° 1, pp. 74-81.
- RIEGEL Martin & alii (1999).- *Grammaire méthodique du français*.- Paris : PUF.- 646 p..- (« Linguistique nouvelle », collection dirigée par SERBAT, Guy et TAMBA Irène).
- VET Co (1980).- *Temps, aspect et adverbes de temps en français contemporain* : essai de sémantique formelle.- Genève : Droz.- 185 p.
- VET Co (1981).- « La notion de 'monde possible' et le système temporel et aspectuel du français » in *Langages*, n° 64, pp. 109-124.
- VET Co (2002).- « Les adverbes de temps » pp. 179-192 in *Temps et Aspect* : de la morphologie à l'interprétation.- Saint-Denis : Presses Universitaire de Vincennes.- 226 p..- (Collection « Sciences du Langage »).
- VETTERS (1989).- « Grammaire générative et textuelle des temps verbaux » in *Recherches linguistiques de Vincennes*, n° 18, pp. 101-145.
- VETTERS Carl (1996).- *Temps, aspect et narration*.- Amsterdam-Atlanta : Rodopi.- 216 p..- (Collection « Etudes de langue et littérature française », publiées sous la direction de BUSBY, FREEMAN, HOUPPERMANS, PELCKMANS et VET).
- VETTERS Carl & DE MULDER Walter (1999).- « Temps verbaux, anaphores (pro)nominales et relations discursives » in *Travaux de Linguistique*, n° 39, pp. 37-58.
- VOGELEER S. (1994).- « Le point de vue et les valeurs des temps verbaux » in *Travaux de linguistique*, n° 29, pp. 39-57.

VUILLAUME Marcel (1990).- *Grammaire temporelle des récits*.- Paris : Minuit.- 122 p.- (Collection « Propositions »).

VUILLAUME Marcel (1993).- « Le repérage temporel dans les textes narratifs » in *Langages*, n° 112, pp. 106-126.

Çavkaniyên li ser zimanê kurdî :

AKRAWY (1982).- « Tense of the verb » in *Standard Kurdish Grammar*. (Çavkanî : <http://www.xs4all.nl/~tank/kurdish/htdocs/lang/Burhan/77.html>)

AYDOGAN Ibrahim (2006), *Temps, subordination et concordance des temps dans les romans kurdes* : étude descriptive sur le système verbal et la subordination temporelle en kurde, thèse de doctorat, Université de Rouen.

AYDOGAN Ibrahim (2006).- « Nécessité d'une approche interdisciplinaire pour l'étude de la langue kurde : identification des temps verbaux », xebata ku bi devkî pêşkêşî Colloque Jeunes Chercheurs en Science du Langage bûye, Coldoc06 : *Intra-disciplinarité Extra-disciplinarité en Science du Langage*, 14-15 juin 2006, à l'Université de Paris X.

AYDOGAN Ibrahim (2005).- « La naissance et le développement de la prose kurde », xebata ku bi devkî pêşkêşî kongreya AFEMAM'ê ya 2005'an bûye: *Musulmans d'Europe et d'ailleurs - Gens d'ailleurs en terres d'Islam*, 7-9 juillet 2005, à l'Université de Strasbourg.

BADILLI (1965).- *Türkçe izahli Kürtçe Grameri* : Kurmancça Lehçesi.- Ankara : Ankara Basim ve Ciltevi.- 192 p..

BARNAS Rojen (1993).- « Kişandin û navlêkirina deman » in *Kurmancî*, n° 12, p. 5.

BEDIR KHAN Emir Djeladet Ali & LESCOT Roger (1991).- *Grammaire kurde*: dialecte kurmandji.- Paris: Jean Maisonneuve.- 372 p.

BEDIR KHAN, Kamuran (1989).- *Le kurde sans peine*: cours pratiques de la langue kurde.- Paris : Institut Kurde de Paris.- 206 p.

BEDIR-KHAN Kamiran (1932).- « Hevxistina Zmanan » in *Hawar*, n° 3.

BEDIR-XAN Celadet Ali (1998).- *Elfabêya kurdî*: bingehên gramera kurdmancî.- Istanbul: Doz.- 112 p.

BLAU Joyce & BARAK Veysi (1999).- *Manuel de kurde*: kurmanji.- Paris: L'Harmattan.- 225 p.

BURKAY Kemal (Baran) (1997).- *Dersên zmanê kurdî* : türkçe izahli kürtçe dil dersleri.- Istanbul : Deng, 5° éd.- 167 p.

CIWAN Murad (1992).- *Türkçe açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi*: Kurmanc lehçesi.- Bälinge (Suède): Jîna Nû.- 224 p..

- FATTAH Ismaîl Kamandar (2000).- *Les dialectes kurdes méridionaux* : étude linguistique et dialectologique.- Leuven : Peeters.- 919 p.- (« Acta Iranica », Encyclopédie permanente des études iraniennes).
- HACO Zerdest (1982/2002).- « Dem di Kurmaciya Bakur de » in *Hîwa*.
- HIRORÎ Newzad (2005).- « Ergatîvî mohra kurmanciyê ye » in *Nefel*, http://www.nefel.com/kolumnists/kolumnist_detail.asp?MemberNr=10&RubricNr=24&ArticleNr=202,
- JEMO Mamed (1991).- *Le système verbal et la conjugaison des verbes kurdes* : La Beschelle Kurde.- Paris.- (Ev xebat nehatiye çapkirin. Çavkanî : Pirtûkxaneya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê).
- JEMO Mamed (1995).- *Eléments de la grammaire kurde* : kurmandji.- Lille, publication individuelle.-138 p.
- KALBASI Iran (1994).- « Essai du comparaison du système verbal des dialectes Kurdes de Mehabad, Sanandaj et Kermansah » *Acta Kurdica*, vol XV, London.
- KARTAL Huseyin (2006).- *Demên kurdî*. (amade dibe).
- KURDO Qanatê (1990).- *Gramera zmanê kurdî*: kurmançî, soranî.- Bromma: Roja Nû.- 335 p.
- KURMANÇÎ* : kovara Grûba Kurmançî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, n° 1-34, 1987-2005.
- MOKRI, Mohammad (2002).- « La morphologie du verbe kurde », in *Journal Asiatique*, n° 290.1, pp. 31-52.
- RIZGAR, Baran (1993).- *Uygulamali Kürtçe Dersleri*: Dersên Kurdî.- London : Lithosphere.- 391 p..
- SAGNIC Feqi Huseyn (1991).- *Hêmana Rêzimana Kurdî*.- Istanbul : Melsa.- 240 p..
- TAN Sami (2000).- *Waneyên rêzimanê kurdî*.- Istanbul: Welat.- 190 p.
- TAN Sami (2005).- *Rêziman û Rastnivîsîna Zaravayê Kurmançî*.- Istanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.- 352 p..
- TAN Sami (2005b).- « Eta Heyato çawa lê hato! », in *Tûrik*, n° 26, p. 2.
- TAN Sami (2006).- « Di hevokên hevedûanî de ahenga deman », in *Tûrik*, n° 47 p. 2.
- YALÇIN Evin (2000).- *Etude comparative de six grammaires récentes sur le système verbal en kurde*, mémoire de DREA à l'INALCO.
- YALÇIN Evin (2001).- *La morpho-syntaxe du verbe kurde*, mémoire de DEA à l'Université de la Sorbonne Nouvelle- Paris III.
- ZILAN Reşo (1989).- « Reformek Pêwîst e » in *BERGEH*, n° 1-6.